BUROYA KURDÎ
ya Pêwendî û Agahdariyê

Bultena agahdariyê N° 54 - Çirî 2009
Quai aux Pierres de Taille (Arduinkaai) 11, 1000 Bruxelles - Tél. 02 219 80 60
www.kurdishbureau.be kurdishbureau@scarlet.be

XEBATA BUROYA KURDÎ

Îlon 2009

XURÎNIYEKE PIRÇANDÎ

06.09.2009 : Rêxistina Citizenne, bi hevkariya rêxistinên cihê ku ji wan Buroya Kurdî, xurîniyeke (xwarina serê sibê) ya pirçandî li navenda çandî De Kriekelaar pêk anî. Amanca vê çalakiyê ne bitenê tamkirina xwarinên welatên cihê, lê ferzenddayîna baştir hevdunaskirinê bû.

Çar maseyên xurîniyê yên cihê, kurdî, rûsî, afrîqî û latîno-amerîkî, hatin vekirin. Bi ser de jî, her gelek tiştên xwe yên taybetî raxistin. Buroya Kurdî nexşeya Kurdistanê û ala kurdî danîn. Mêvan hatin tev li hev kirin û li dora maseyên piçûk 7-8 kesên ji netewahiyên (cinsiyyet) cihê hatin rûniştin. Li dora lîzekê, 5 pirsên ku ji berê her rêxistinek amade kiri bûn hatin pirsîn. Buroya Kurdî 5 pirs li ser ciyê coxrafî yê Kurdistanê, gelê kurd, ziman, muzîk û xwarinên kurdî pirsîn.

KONFÊRANS

07.09.2009 : Krîtêrên êtnîkî di zagona (qanûn) beljîkî li dijî nijadparêziyê de

François Sant'Angelo, huqûqzan li Navenda ji bo Wekheviya Bextan û Têkoşînê li dijî Nijadparêziyê, kurteya rêzayê (m'ana) gotina „êtnî" got : Bi giştî gotina „êtnî" komên kesên ku heman (eynî) çandê – ango, ziman, urf û adetan û carna jî olê – pay dikin û ku ji aliyê gelheyên din tên pejirandin (qebûl kirin) wasf dike. Bi ser de jî, dîroka xemgîn û nijadkujî, yan ola bindest dikarin vî hestî (hiss) xurttir bikin. Wî weka nimûne Kurd, Ermenî û Cihû nîşan dan. Evên dawîn di zagona belgjîkî ya 30 Tîrmeh 1981 de weka „rih" (asl) hatine dest nîşan dan.

Sant'Angelo got jî ku li gora hin lêgerînan, gotina "bapîrê pêşîn" ê komên êtnîkî ji rastiya jênêtîk bêtir avakirineke civakî-çandî ye. Loma, divê ku gelhe bixwe, ne kesên din ji derve, xwe weka êtnî wasf bike. Wî, weka nimûne, tundiya (şiddet) êtnîkî li Rwanda û Burundî got.

www.arivakurd.org

NÛÇE JI KURDISTANÊ

Îlon 2009

KURDISTANA TIRKIYÊ

XWEPÊŞANDANEKE MEZZIN LI DIYAR-BEKIRÊ

Di 01 Îlon 2009 de, xwepêşandaneke (meşîn) mezzin ji bo çarekirina dêmokratîk a pirsa kurdî li parka Sumerê, li Diyarbekirê, ji aliyê Kogreya Civaka Dêmokratîk (KCD) hat pêk anîn. Li ber hezaran kes, şaredarê Diyarbekirê, Osman Baydemir; hev-serokê partiya kurdî DTPê, Ahmet Türk û birêvebirê KCDê, Hatip Dicle, axivîn. Ahmet Türk got ku Abdullah Öcalan klîta çareya pirsa kurdî ye û ku nabe ku ew bê dayîn alîkî. Hatip Dicle jî Öcalan weka "muhatap" wasf kir.

(netkurd.com, Hürriyet, peyamner.com, azady.nl, rudaw.net, 02.09.2009)

BOMBEKIRINA KURDISTANA IRAQÊ

Di 04 Îlon 2009 de, piştî demeke hêsa, leşkerê tirkî ji nuh de dest bi bombekirina gundên sînorî yên Mirgewerok, Mûsiluk, Gava Zerkê û yên din, ên parêzgeha Hewlêrê, navçeya Xwakurkê, qezayê Sîdekanê, li Kurdistana Iraqê, kir.

(pukmedia.com, azady.nl, rudaw.net, 04.09.2009 ; peyamner.com, 05.09.2009)

QEDEXEKIRINA NAVÊN KURDÎ

Di Îlon 2009 de, muxtarê taxa Kayapınarê, ya bajarê Diyarbekirê, Cemal Hüsnü Kansız, navên kurdî yên navanda çandî « Cegerxwîn » û parkên Rojbîn, Ronî, Sosin, Roşan û Bêzar qedexe kirin. Lê di heman (eynî) demê de, giftûbêj li ser çarekirina pirsa kurdî dajon !

(netkurd.com, rudaw.net, 05.09.2009)

BÎRÊN MIRINÊ (dûmahîk)

Di dema kolanên li ser riyeke nêzîkî gundê Basîskê, li navçeya Şirnexê, de hestiyên ku bi beran (gulle) qul bûne û cillên du kesan, ku ji wan jinek, hatin dîtin. Malbatek ji Cizîrê daxuyand ku ev jin keça wan, Makbule Ökdem, bû. Ew di 1994 de çekdareke PKKê bû. Li gora hin kaniyan, vekolîneke dozkarê (prokuror) Komarê aşkere kir ku di salên 1990 de ev cî weka bingeheke leşkerî ya hêzên antî-têrrorê, JITEM, û rêxistina islamî Hizbullahê hati bû bi kar anîn.

(pukmedia.com, 06.09.2009)

JÊPIRSÎNA KEÇEKE PIÇÛK HAT RAWES-TANDIN

Jêpirsîna keçeke piçûk, Medya Örmek, ku fêrên kurdî li mala xwe didan zarokan (li buleta me ya buhurî binêre), û ya dê û bavê wê û şaredarê Surê, Abdullah Demirtaş, hat rawestandin.

(Milliyet, malperên kurdî, 09.09.2009)

ŞANDEKE BASKÎ LI KURDISTANÊ

Di Îlon 2009 de, şandek bi serokatiya serokê Parlementa Baskî, Xabier Aspuro, çû Diyarbekirê û protokolek bi şaredarê Surê, Abdullah Demirbaş, re wajo (imza) kir. Li gora vê protokolê, ewê 4.000 tene ji 365 çîrok û destanan, di 12 pirtûkên bi kurdî, ermenî û suryanî de bên weşandin û belav kirin.

(aknews.com, netkurd.com, 10.09.2009; pukmedia.com, 11.09.2009)

SEREDANEKE AMERÎKÎ PARTIYA HAK-PARê

Di 10 Îlon 2009 de, birêvebirê servîsa ramyarî (siyasî) li balyozxana (sefaret) amerîkî li Ankarê, Rodney Hunter, û danişmenda (muşawir) vê servîsê, Jale Ersoy, çûn seredana buroya partiya ku bi awakî ne fermî kurdî ye, HAK-PARê. Ew ji aliyê sekreterê giştî yê vê partiyê, Bayram Bozyel û her du cîgirên xwe, Fehmi Demir û Celal Yıldız, hatin pêşwazî kirin.

Her du alî çarekirina pirsa kurdî, rewşa ramyarî li Tirkiyê, pêwendiyên Tirkiyê bi Herêma Kurdistana Iraqê re ... giftûbêj kir.

(netkurd.com, rizgari.org, kurdistan-news.net, 11.09.2009)

RAGIRTINA ENDAMÊN DTPê

Di 11 Îlon 2009 de, polîsê tirkî 17 endamên partiya ku bi awakî ne fermî kurdî ye, DTP, ku ji wan alîkarên şaredaran û endamên encumenên şaredariyan, ragirtin. Di 13 Nîsan 2009 de, ji 300 endamên vê partiyê bêtir hati bûn ragirtin. Ew bi xwestina nehiştina "Vekirina Dêmokratîk », ango tecrubeyên hukûmeta tirkî ku pirsa kurdî çare bike, hatine tawanbar kirin.

(netkurd.com, kurdistan-news.net, 11.09.2009)

DU TAWANBARKIRIN JI SEDEMA ALA KURDÎ

Du Kurdên Tirkiyê, Adil Mutlu û Mehmet Şerif Özbek, li Kurdistana Iraqê kar kiri bû. Dema ku vegeriyan Kurdistana Tirkiyê ji bo derbaskirina tatîlê, li deriyê sînorî Ibrahîm Xelîl t-shirt (kiras), bac û kartên ku li ser wan ala kurdî heye hatin stendin û ji her yek ji wan re cezayê 10 meh zîndan, bi tawana propaganda têrrorîst, hat dayîn !

(rudaw.net, 17.09.2009)

www.arsivakurd.org

280 PIRTÛKÊN KURDÎ LI PIRTÛKXANA NETEWEYÎ YA TIRKÎ
Li pirtûkxana neteweyî ya tirkî ku tê de 3 milyon pirtûk hene, 280 pirtûkên bi kurdî hene. Piraniya wan piştî salên 1990 hatine weşandin, ji bo ku ji berê zagon (qanûn) danîna wan li vê pirtûkxanê qedexe bû.

Ji van pirtûkan, ferheng, rêziman, pirtûkên dîrokê, destana Mem û Zîn a Ehmedê Xanî ...
(peyamner.com, 18.09.2009)

BERPIRSIYARÊN DTPê LI KURDISTANA IRAQÊ
Ji 15 heta 18 Îlon 2009, şandeke partiya kurdî DTPê, bi serokatiya serokê vê partiyê, Ahmet Türk, çû Kurdistana Iraqê û li Suleymaniyê rastî serokê Iraqê, Celal Talabanî, û piştre li Hewlêrê Mesûd Berzanî, serokê Kurdistanê hat. Şande bi berpirsiyarên ramyarî (siyasî) yên din û şandeke partiyên ramyarî ya Kurdên Sûriyê jî hevdîtin kirin.

Amanca seredanê stendina piştgiriya Kurdên Iraqê ji „Vekirina Dêmokratîk“, ku ji aliyê hukûmeta tirkî ji bo çarekirina pirsa kurdî hatiye dest pê kirin, re bû.
(Malperên kurdî, 16, 17, 18 û 19.09.2009)

CÊWÎBÛNA DU ŞAREDARIYÊN KURDISTANA TIRKIYE Û IRAQÊ
Di 28 Îlon 2009 de, şaredarê bajarê Duhokê, Şervan Abdulwahîd, tevî şandekê çû seredana şaredarê Surê, li bajarê Diyarbekirê, Abdullah Demirtaş.

Seredan li ser vexwendina (dawet) Abdullah Demirtaş bû. Her du şaredar protokoleke cêwîbûna şaredariyên xwe wajo (imza) kir.
(rizgari.org, rudaw.net, avestakurd.net, aknews.com, 29.09.2009)

KURDISTANA IRAQÊ

17.000 PENABERÊN KURD LI KURDISTANÊ
Nimînendeyê hukûmeta Kurdistana Iraqê li bal UNê (Rêxistina Neteweyên Yekbûyî), Dîndar Zîbarî, daxuyand ku heta nuha ji 16.000 heta 17.000 penaberên kurd, ku ji perçeyên din ên Kurdistanê hatine, li Kurdistana Iraqê dijîn. Û wî got jî ku hukûmeta Kurdistanê li dijî vegerandina bi zorê ya van penaberan e û ku wê çend proje ji bo baştirkirina mercên jiyana wan amade kirine.
(rudaw.net, 03.09.2009)

SEREDANA HUQÛQZANÊN KURD ALMANYA
Di 07 Îlon 2009 de, şandeke huqûqzanan, bi serokatiya serokê Yekîtiya Huqûqzanên Kurdistanê, Tofîq K. Sadiq, çû bajarên cihê yên Almanya ji bo naskirina pergala (sîstêm, nizam) huqûqî ya almanî û çalakiyên sazendeyên wê yên cihê, weka dadgeh, zîndan ... seredana wezîrê dadê û berpirsiyarê entêgrasyonê.

Rêxistina kurdî NAVEND ewê di 13 Îlon de konfêransekê li zanîngeha Bonnê, ku ewê tê de endamên vê şandê bipeyivin, pêk bîne.
(netkurd.com, 08.09.2009)

ÊRÎŞ LI NAVÇEYÊN KURDÎ YÊN EREBKIRÎ
Di 09 Îlon 2009 de, erebeke mînkirî li taxa Urubiyyê, li Kerkûkê, teqiya. 3 kes mirin û 15 jî birîndar bûn.
(pukmedia.com, 09.09.2009)

Di 10 Îlon de, bombeyek li gundê Werdikê, qezayê Qereqoşê, parêzgeha Mûsilê, teqiya. Nêzîkî 30 kes mirin û 25 xanî hilweşiyan.
(peyamner.com, rudaw.net, avestakurd.net, 10.09.2009; Al-Hayat, 11.09.2009)

Di 13 Îlon de, bombeyek li ser karwaneke polîs, li nêzîkî kollêja têknîkî ya zanîngeha Kerkûkê, teqiya. 3 polîs birîndar bûn.

Birevebirê polîsê Kerkûkê, Yadgar Şikûr, daxuyand ku bombeyeke din li nêzîkî bazarekê teqiya û zararên mezzin ên maddî anîn.
(pukmedia.com, 13.09.2009)

VEKIRINA AKADÊMIYEKE TÊKNOLOJIYÊ
Di 12 Îlon 2009 de, bi amadebûna balyozê (sefîr) Korêya Başûr, serokwezîrê Kurdistana Iraqê, Nêçîrvan Berzanî, Akadêmiya Têknolojiya Zaniyariyan (IT Academy), ku bi hevkariya Korêya Başûr hat ava kirin, vekir.

Şirketa Korêya Başûr, Korea International Cooperation Agency (KOICA), alîkariya hukûmeta Kurdistanê kir ku jimareke projeyan, ku ji wan IT Academy, pêş de bibe û bi cî bîne.
(aknews.com, peyamner.com, netkurd.com, nefel.com, rizgari.org, 12.09.2009)

www.arsivekurd.org

SEROKWEZÎRÊ KURD Ê NUH
Di 16 Îlon 2009 de, piştî hilbijartinên parlementerî yên 25 Tîrmeh 2009 (li her du bultenên me yên dawîn binêre), parlementa Kurdistanê Dr. Behrem Salih weka serokwezîr û Azad Berwarî weka cîgirê wî hilbijartin. Mîrza Salih 73 li dijî 28 deng stendin.
(peyamner.com, netkurd.com, avestakurd.net, rizgari.org, 16.09.2009)

HUNDAKIRINA PÊTROLÊ JI SEDEMA GENDELIYÊ
Di 16 Îlon 2009 de, pisporê karên pêtrolê, Bêwar Xisnî, daxuyand ku 51.000 bermîlên pêtrolê li Kurdistanê hunda bûn, ji sedema gendeliyê (ruşwet) li nav sazendeyên iraqî yên pêtrolê. Û wî got jî ku her roj li Iraqê 250.000 bermîl pêtrol hunda dibin û ku para Kurdistanê ya pêtrola Iraqê 17% e.
(nefel.com, 16.09.2009)

WEZÎRÊ TENDURUSTIYÊ LI ALMANYA
Di 15 Îlon 2009 de, li Hamburgê, li Almanya, lihevkirinek di navbera wezîrê tendurustiyê (saxî) yê Kurdistana Iraqê, Dr. Ziryan Yonês, û sênatorê parêzgeha Hamburgê û berpirsiyarê hevkariya di warê tendurustiyê de, Dietrich Wersich, de hat wajo (imza) kirin. Amanca wê bilindkirina asta (sewiye) servîsên tendurustiyê li Kurdistana Iraqê ye.
(netkurd.com, avestakurd.net, 17.09.2009)

CÎGIRÊ SEROKÊ AMERÎKÎ LI KURDISTANÊ
Di 17 Îlon 2009 de, cîgirê serokê amerîkî, Josef Biden, çû Kurdistana Iraqê û rastî serok Mesûd Berzanî hat.

Her du alî pêwendiyên Hewlêrê bi Bexdadê re û pirsên wan ên li ser zagona (qanûn) gaz û pêtrolê, pirsa pêşmergan, buce (mîzaniyye) û bicîanîna bend 140 a destûra iraqî (ya li ser navçeyên kurdî yên erebkirî) giftûbêj kirin.

Piştî rasthatinê, Mîrza Berzanî û Biden konfêranseke çapemeniyê ya hevrayî pêk anî. Biden dilxweşiya xwe ji pêşdeçûna mezzin a Kurdistana Iraqê ravekir û got ku hukûmet û gelê amerîkî êşên gelê kurd li bin rejîma Saddam Husseyn dizanin. Û wî şaşbûna xwe ya mezzin ji rola dîrokî, hestê berpirsiyariyê, serxwebûn û jêhatîbûna Mîrza Berzanî, ku alîkariya gelê kurd kir ku li hemberî rejîma Baasê raweste, ravekir.
(peyamner.com, avestakurd.net, nefel.com, rizgari.org, kurdistan-news.net, 18.09.2009)

KURDISTANA ÎRANÊ

BOMBEKIRINA KURDISTANA IRAQÊ
Di 09 Îlon 2009 de, leşklerê îranî navçeyên sînorî yên Kanî Sêw, Ava Spî, Bilsen, Dola Rimê, çiyayê Mamend û çiyayê Hemrînê, li nahiya Helşo, qezayê Pişder, li Kurdistana Iraqê, bombe kirin. Muxtarê Helşo daxuyand ku ev bombekirin piştî şerrekî di navbera PJAK (baskê îranî yê PKKê) û leşkerê îranî de bû.
(pukmedia.com, 09.09.2009)

XWENDEKAREKÎ KURD TÊ QEWIRANDIN
Li gora encumena xwendekaran HRA, encumena dîsîplînê (nizam) a zanîngeha Razî li Kirmanşahê, li Kurdistana Îranê, xwendekarê kurd Aşkan Mosîban du hefte qewirand. Mosîban çalakvan û nivîskarekî bultena agahdariyê ya xwendekarên vê zanîngehê, Taxen Vasan, e. Ew bi tevlihevkirina nizama giştî ya zanîngehê û pêkanîna civînên îllêgal hat tawanbar kirin. Bi giştî, li Îranê jimara xwendekarên çalak ku bi awakî katî yan hergavî (dayimî) tên qewirandin bilind bûye.
(hra-iran.org, 13.09.2009)

ÇAR KURD TÊN ÊRÎŞ KIRIN
Li gora ajansa îranî ya çapemeniyê, Fars News Agency (FNA), bû du car e ku dadmendek (hakim) li Sinê (Sanandaj), li Kurdistana Îranê, tê êrîş kirin. Hasan Davtalab ji stuyê xwe birîndar bû û nuha li nexweşxanê ye. Berê wî, şêxê kurd, Borhan Alî, jî li Sinê hati bû kuştin.
(rudaw.net, 16.09.2009)

Di 17 Îlon 2009 de, berpirsiyarekî encumena parêzgeha Sinê, Muhammed Şêx El-Islam, li ber mala xwe hat gulle kirin.
(avestakurd.net, 17.09.2009; azady.nl, 18.09.2009)

www.arsivakurd.org

KURDISTANA SÛRIYÊ

XWEPÊŞANDAN JI BO 5 JINÊN KURD

Di 03 Îlon 2009 de, xwepêşandanek ji bo 5 jinên kurd ku li bajarên cihê, weka Raqqa, Qamişlî, Dêrik û Kobanî, hatin ragirtin, bû.

Berê çend rojan, bê ku sedema vê yekê bê zanîn, ev jin li bajarên cihê hati bûn ragirtin û êşkence kirin.
(netkurd.com, 04.09.2009)

RAGIRTINÊN GIRSEYÎ YÊN ÇALAKVANÊN KURD

Li gora rêxistina kurdî ya mafên mirov li Sûriyê, MAF, ji 16 Tebax 2009 de, ji 6 jinên kurd bêtir li bajarên cihê hatin ragirtin. Di rappora xwe de, ew dibêje ku 4 kesên ku li Dêrikê di warê folklora kurdî de kar dikir hatin ragirtin : Du xuşk, Esma û Ayhan Murad, Yûsif Seyfo û Adnan Demo ji bo jêpirsînê hatin bang kirin û piştre hunda bûn.

MAF dibêje jî ku Haşim Beşîr, Julî Ibrahîm, Usama Fawwaz, Hozan Ahmed, Zuhêr Ismaîl û Idrîs Seîd Şakir, ji Hesîçê, di 17 Sibat 2009 de hatin ragirtin.

Çalakvan û avakerê MAFê, Ibrahîm Yûsuf, got ku jimara ragirtina çalakvanên kurd bilind dibe. Û wî got jî ku çalakvan Rojîn Remo jî li Menbijê, li nêzîkî Helebê, hat ragirtin.

Di daxuyaniyeke din de, MAF got ku berê çend rojan, hêzên ewlehiyê yên sûrî êrîşî malekê li taxa Zorava, li Şamê, kir û du jin, Feleknaz Xelîl û Afra Muhammed, bê fermana (emr) dadmendiyê (edalet), hatin ragirtin. Feleknaz ji dil nexweş e û Afra jî felc bûye.

Mustafa Oso, serokê DADê, got ku ragirtina van her jinan pelixandineke mafên mirov e û ji desthilatên sûrî xwest ku ew tavil (pirr zû) bên azad kirin.
(rudaw.net, 04.09.2009; Ekurd, azady.nl, 05.09.2009)

Di 09 Îlon 2009 de, hêzên ewlehiyê yên sûrî Jîndar Abdulselam Berekat, 24 salî, li mala wî, li Hesîçê, ragirt. Sê roj şûn de, ew hat birin buroya polîsê leşkerî li Qamişlî.

Di 11 Îlon de, Mahmûd Zubeyr Mehmûd, 19 salî û endamê Pariya Dêmokrat a Kurd li Sûriyê „El-Parî"; Abdfulwehat Şêxmûs El-Faris, 19 salî, û Zubeyr Hesen Mehmûd, 46 salî, li Qamişlî hatin ragirtin. Piştî ragirtina herduyên pêşîn di nîvê şevê de, li bazara Qamişlî, nêzîkî 50 polîs ketin mala Zubeyr Hesen Mehmûd û çend kovar û CD'yên muzîka kurdî yên koma folklorîk Narîn stendin.
(amude.com, 14.09.2009; rudaw.net, 15.09.2009)

28 SERBAZÊN KURD JI 2004 DE HATINE KUŞTIN

Rêxistina Mafên Mirov li Sûriyê daxuyand ku ji dema serhildana kurdî ya 12 Adar 2004 de, 28 serbazên (esker) kurd di dema xizmeta leşkerî de hatine kuştin.
(Maf, avestakurd.net, 04.09.2009)

XWESTINA RAKIRINA BIRYARNAME N° 49

Di 10 Îlon 2009 de, çend partiyên ramyarî (siyasî) yên kurdî yên Sûriyê ji desthilatên sûrî xwest ku Biryarname N° 49 ya 10 Îlon 2008 rake. Ev biryarname firotin û kirêkirina axên ku li nêzîkî sînor in, weka Qamişlî û Hesîçê, qedexe kirine.

Van partiyan got ku ev biryarname li dijî destûra sûrî ye û ji civaka navneteweyî û partiyên sûrî xwest ku mafên Kurdan li Sûriyê biparêzin û li ser hukûmeta sûrî fişar (zaxt) bikin ku vê biryarnamê rake.
(peyamner.com, avestakurd.net, 10.09.2009)

SÛRIYE KURDEKÎ KU JI ALMANYA HATIYE VEGERANDIN RADIGIRE

Di 01 Îlon 2009 de, Almanya xortekî kurd, Xalid Kenco, vegerand Sûriyê, piştî ku daxwaziya wî ya penaberiyê ne pejirand (qebûl ne kir).

Di 13 Îlon de, hêzên ewlehiyê yên sûrî ew li Qamişlî ragirt. Heta nuha haya tukesî jê nîn e. Kenco berê 7 salan reviya bû Almanya.
(avestakurd.net, 29.09.2009)

www.arsivakurd.org

NÛÇEYÊN ÇANDÎ YÊN KURDÎ

XELATA MAFÊN MIROV JI KURDEKE CUHAN RE LI ALMANYA

Di 05 Îlon 2009 de, ewê rêxistina almanî Pro Asyl li Frankfurt am Main xelata mafên mirov bide penabereke kurd a cuhan a Sûriyê, Nesrîn Elî, 19 salî, ji bo çalakiyên wê yên ji bo parastina penaberan.



Nesrîn Elî ji 2002 de bi malbata xwe re li Almanya dijî, lê wê hîn mafê penaberiyê ne stendiye. Malbat li navendeke mezzin a pêşwaziya penaberan li Bayreuth, li parêzgeha Bayrernê, li başûrê Almanya dijî û li bendê ye ku bê vegerandin Sûriyê.

Ev malbat yek ji yên "biyanî" ye, ango ji 250.000 Kurdên Sûriyê ku netewahiya wan a sûrî di 1962 de ji wan hatiye stendin. Nesrîn biryar stend ku ji bo mafên penaberan li Almanya li ber xwe bide. Wê ev xelat ji bo çalakiyên xwe yên di vî warî de stend. Kanala têlêvîzyona almanî "Bayrisches Feernsehen" li ser jiyana wê peyivî û pê re hevpeyvînek kir.
(amude.com, 04.09.2009)

KURDEKÎ ERMENISTANÊ DIBE ENDAMÊ „INTERNATIONAL BIOGRAPHICAL CENTRE"

Di Îlon 2009 de, rojnamevanê kurd ê Ermenistanê yê navdar, Emerîkê Serdar, nameyeke germ ji Nicholas S. Lou, birêvebirê « International Biographical Centre », ku li Cambridge, li Ingilterê ye, stend. Di namê de jê re tê daxuyandin ku ew bûye endamê vê rêxistina birûmet, ji sedema karê xwe yê pispor. Mîrza Serdar ewê nîşanek û bawernameyekê (sertîfîka) bistîne.
(netkurd.com, 09.09.2009)

KURDEK DI ALPÎNÎSMÊ DE DIBE 3mîn

Di Îlon 2009 de, 25mîn « championnat » navneteweyî ya alpînîsmê (hilkişîna çiya) li Campodolcino, li Îtalya, bû. Cuhanekî kurd ê Tirkiyê, Alper Demir, xelata 3mîn stend.
(avestakurd.net, 11.09.2009)

KURD LI KONGREYEKE NAVNETEWEYÎ LI POLONYA

Ji 06 heta 08 îlon 2009, nimînendeyê Hukûmeta Herêma Kurdistana Iraqê li Polonya (KRG), Ziyad Reûf, beşdar bû « Kongreya navneteweyî ji bo Aşîtiyê. Gel û Ol » (International Congress for Peace. People and Religions), ku li Krakovî, li Polonya, bi hinceta sersaliya 70mîn a dawiya Şerrê Cihanê yê 2mîn, bû.

Piştî merasîm û giftûbêjên cihê, beşdar çûn seredana kampa naziyan a Auschwitz-Birkenau, ku tê de rêveçûnek û merasîmek hatin pêk anîn.
(Krg-Polonya, 14.09.2009)

NÎŞANÊN ZÊRÎN Û ZÎVÎN JI DU PEHLEWANÊN KURD LI TAYLANDÊ RE

Di Îlon 2009 de, 4 pehlewanên kurd ên Iraqê beşdar bûn "championnat" 43mîn a Asyayî ya "Bodybuilding" (xurtbûna laş), li Pattay, li Taylandê.

Nizar Ahmed nîşaneke zêrîn û Serdar Ismaîl jî nîşaneke zîvîn stendin.
(azady.nl, 13.09.2009)

www.ersivakurd.org

NÎŞANEK JI BRONZ JI KURDEKÎ LI ÎTALYA RE

Di 13 Îlon 2009 de, li Mîlano, li Îtalya, « Championnat » Cihanê ya Boksê, katêgoriya 51 kg, bû. Kurdekî Rûsya, Mîşa Aloyan, 21 salî, nîşaneke ji bronz stend.

(avestakurd.net, peyamner.com, 14.09.2009)

ŞÛNWARÊN JI 5000 SAL BERÊ ZAYÎNÊ BÊTIR LI DIYARBEKIRÊ

Di Îlon 2009 de, di dema kolanên ku ji aliyê yaneyeke (êkîp) arkêologên zanîngeha tirkî ya Hacettepê dihatin kirin de, avahiyeke 5.800 salî ji Berê Zayîna Îsa li Bismilê, li nêzîkî Diyarbekirê, li Kurdistana Tirkiyê hat dîtin. Di nav xerabeyan de, perçeyên rengîn ên sêramîk, camên volkanî û destgehên (alet) ji kevvir hatin dîtin.

Li gora dêkanê vê zanîngehê, Dr. Halil Tekin, ev ciyê kevnar vedigere dema şareyariya « Halaf »ê.

(rizgari.org, 18.09.2009)

DIRÊJTIRÎN MERIVÊ LI CIHANÊ KURD E

Di Îlon 2009 de, bi hinceta weşana 55mîn a « rekorên cihanî », rêxistina ingilîzî Guinees World Records Sultan Kose, Kurdekî Tirkiyê, 26 salî, weka dirêjtirîn meriv li cihanê pêşkêş kir. Bejna wî 2,46 m. ye û ciyê Bao Xishun, ê çînî, distîne.

(Malperên kurdî, 18.09.2009)

FÊRÊN KURDÎ LI ZANÎNGEHA LONDONÊ

Şaxa Afrîqa û Rojhilata Navîn (SOAS) a Zanîngeha Londonê ewê dest bi fêrkirina zimanê kurdî bike û pirtûka « Kurdiya Nûjen », ku di 2004 de ji aliyê Enstituya Kurdî ya Istanbûlê hatiye weşandin, bi kar bîne. Ewê ev fêr bi riya entêrnêtê jî bên weşandin.

(netkurd.com, aknews.com, 23.09.2009)

KLAVYÊYEK BI ZIMANÊ KURDÎ

Klavyêyeke bi zimanê kurdî, ku tê de tîpên ş, î, ê, û, ç, x, w û q, hene, bi navê « Celadet » li Istanbûlê hat çêkirin. Meriv dikare wê ji navnîşana jêrîn bixwaze :

Toyak Iş Merkezi Meriç Sok, N0 : 11/225 Şirinevler Bahçelievler/Istanbul

info@celadet.com.tr

Tel. : +90 212 4512188

ERMENISTAN DIVÊ KU BÊTIR CÎ BIDE ZIMANÊ KURDÎ

Konseya Ewropa, ku ji 47 welatan, ku ji wan Ermenistan, pêk hatiye, biryar stend ku divê ku Ermenistan bêtir cî bide zimanê kurdî.

Di rappora xwe de, encumena Konseya Ewropa li ser ihmalkirina zimanên hindikayiyan, weka kurdî û asûrî, hişyarî (ixtar) da Ermenistanê.

Rappor ji Ermenistanê dixwaze ku hînkirina kurdî, bi anîna bêtir mamoste û destgehan, baştir bike û bikaranîna zimanên ne ermenî li dadgehan bêtir dabîn (te'mîn) bike.

(rudaw.net, 24.09.2009)

XELATEK JI FÎLMEKE KURDÎ RE LI WELATÊ BASKÎ

Ji 18 heta 26 Îlon 2009, Fêstivala Fîlmê li San Sebastiyan, li Welatê Baskî, li Ispanya, bû. Fîlma kurdî « Min dît", a Miraz Bezar, tê de Xelata „Gazeta" stend.

(avestakurd.net, 28.09.2009)

XELAT JI FÎLMEKE KURDÎ LI TIRKIYÊ RE

Di 27 Îlon 2009 de, fîlma kurdî « Güneşi Gördüm » (Min Tav Dît), a fîlmçêker û lîzvanê sereke Mahsum Kırmızıgül, Oskar li Ankara stend. Fîlm çîroka malbateke kurdî ku ji sedema şerrê di navbera PKK û leşkerê tirkî de perçe bûye dibêje.

(rudaw.net, Hürriyet, 28.09.2009)

ZENGILEK BI KURDÎ !

Di Îlon 2009 de, zengilên derî ku bi kurdî dipeyivin, "Derî vekin, mêvan hatin", li Wanê, li Kurdistana Tirkiyê, gelek tên firotin. Xwediyê şirketê, Yılmaz Uygun, got ku di van zengilan de 15 zimanên din jî, weka tirkî, rûsî, japonî, erebî û yûnanî, jî hene. Lê ku yên bi kurdî herî bêtir tên firotin. Û wî got jî ku ew nemaze li Bedlîs û Agirî gelek tên firotin.

(avestakurd.net, 28.09.2009)

WEFATA MELIK FIRAT

Di 29 Îlon 2009 de, siyasetvanê navdar Melik Firat, ji nexweşiya „leucémie" (kansêra xwînê), di 75 saliya xwe de wefat kir.

Melik Firat neviyê Şêx Seîd, ku serhildana kurdî ya 1925 li Kurdistana Tirkiyê kiri bû, bû. Ji vê sedemê, ew çend caran, tevî malbata xwe, hati bû sirgûn kirin. Wî zanînên civakî li Dibistana Bilind a Diyarbekirê xwendi bûn. Di 1975 û 1991 de bû endamê parlementa tirkî. Piştre, wî partiya ku bi awakî ne fermî kurdî ye, HAK-PAR, ava kir. Ew ronakbîrekî mezzin, ku çend zimanan dizani bû, bû.

(Malperên kurdî, 29 û 30.09.2009)

www.arsivekurd.org

WEFATA MUHEMMED MELLE EHMED

Di 29 Îlon 2009 de, siyasetvanê kevn û nivîskarê kurd ê Sûriyê, Muhemmed Melle Ehmed, ji kansêrê li nexweşxaneyekê li Dortmund, li Almanya, di 74 saliya xwe de wefat kir. Wî di 1952 de Yekîtiya Civata Xortên Dêmokrat ên Kurd li Qamişlî, li Kurdistana Sûriyê, ava kiri bû. Di 1962 de, bû endamê encumena navendî ya Partiya Dêmokrat a Kurd li Sûriyê. Di navbera 1960 û 1962 de, ew tevî hevalên xwe du caran hat ragirtin. Di navbera 1964 û 1967 de diviya bû ku veşartî bijî. Wî jimareke pirtûkan, ku ji wan dîroka Kurdistan Sûriyê, ku bi erebî û kurdî hat weşandin, nivîsî.

(amude.com, avestakurdnet, 30.09.2009)

BRUSSELS HOOFDSTEDELIJK GEWEST
VLAAMSE GEMEENSCHAPSCOMMISSIE

Ev bulten, bi alîkariya Vlaamse Gemeenschapscommissie (VGC), bi kurdî, fransî, hollandî û ingilîzî hatiye weşandin.

www.arsivakurd.org